şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 498 30-Mijdar- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî



# Li nav zeviyên pembû jiyaneke zehmet

Li Rihayê, erdên pembû ji bo karkeran malovaniyê dikin. Karkerên bi erebeyên hespan tên nav zeviyan rojê 40-45 lîre pere bi dest wan dikeve.
Li gundê Kuloran ê navçeya Eyyûbiye ya Rihayê, erdên pembû ji bo karkeran malovaniyê dikin. Karkerên ji gundên derdorê bi erebeyên hespan tên nav zeviyan rojê 12-13 saetan pembû berhev dikin. Pirraniya van karkeran zarok û jin û rojê ancax 40-45 lîre pere bi dest wan dikeve.
Li nav zeviyan jin û zarok pembû berhev dikin û zilam jî pembuyê berhevkirî dikişînin û bar dikin. Temenê zarokên dixebitin di navbera 12-15 salan de ne. Zarokên li nav erd wekî ji wan re lîstik be pembû berhev dikin. Pirraniya van zarokan di çaxên xwe yên perwerdehiyê de ne, lê belê li gorî hevtemenên xwe 3-4 mehan dereng dest bi dibistanê dikin.
Ebdulrahman Ehmedê 17 salî ku 6 sal berê ji ber şerê li Sûriyê ji Helebê çuye Tirkiyê, tevî birayê xwe yê 16 salî dixebite. Ehmed şeveqê zû tê nav zeviyê û êvarî jî diçe malê. Ehmed, diyar dibêje ku wexta karê pembû diqede ew berê xwe didin herêma Akdenîzê û dest bi karê narinciyan dikin. Ehmed, got 6 sal in ew li nav zeviyan dixebite.
Emîne Karataş a 60 salî ku ji Pirsûsê ji bo berhevkirina pembê diçe Kuloranê, tevî 3 keçên xwe pembû berhev dike. Karataş, diyar dike ku 5 sal berê hevjînê wê miriye û ji ber vê ew û keçên xwe dixebitin. Karataş, anî ziman ku ew nexweş e lê dîsa jî rojê 12 saetan pembû berhev dike. Karataş, anî ziman ku her sal ji havînê heta van çaxan karê wan ev e. Karataş, dibêje ji ber vî karî li stû û newqa wê fitiq peyda bûye û êdî wek berê nikare bi rihetî bimeşe. Karataş dibêje: “Ka em çi bikin, em nexweş bin jî em mecbûr in bixebitin.”...*MA*











# Çiqas pirsgirêk kêm bin, riya vegerê kêm kurt dibe

**Idrîs HENAN**

Bi mebesta çareserkirina pirsgirêkên civakê, bi destpêka aloziya Sûriyê re li herêmên Rojavayê Kurdistanê û Parêzgeha Helebê komîteyên Lihevanînê hatin avakirin. Bi navberkariya van komîteyan, astengî û aloziyên navbera ferdên civakê de tên çareserkirin.

**BI KOÇBERIYÊ RE PIRSGIRÊK ZÊDE BÛN**

Piştî ku gelê Efrînê bi darê zorê hate koçberkirin, li gund, navçe û herdu kampên Berxwedan û Serdem de li Kantona Şehbayê bicih dibe. Ji ber ku heft salin gelê Efrînê di bin siya Rêveberiya Xweser de birêxistinkirî ye, demildest komîteyên xwe yên rêxistinî ava kir. Yek ji girîngtirîn komîteyên hatina avakirin; Komîteya Lihevanîna Civakî ye. Di vê derbarê de Endamê Meclîsa Giştî ya Lihevanîna Civakî li Kampa Berxwedan Mihemed Şêxo Îsmaîl ji rojnameya me re got: Bi koçberiya gelê Efrînê re pirsgirêkên civakî jî zêde bûn. Rêjeya mezin ji pirsgirêkan pala xwe didan rewşa dagirkeriyê. Vê yekê bandor li derûniya gel dikir û di nav civakê de pirsgirêkên cidî derdixit.

**CIVAK BI RÊBAZA ME QAYÎL E**

Îsamaîl derheqê rêbazên lîcneyên çareserkirina pirsgirêkan de got: Em bi rêbazên çandî, exlaqî û civakî nêzî pirsgirêkan dibin. Li gorî gerdiş û rayîşên civakî ku bi hezaran salan zindî ne, pirsgirêk û aloziya ku derdikevin tên çareserkirin. Îsmaîl ev tişt jî li gotinên xwe zêde kir: Endamên komîteyên lihevanînê bi giranî kesên xwedî tecrube, rûspî û hizirmend in. Him hêza wan a çareseriyê heye, him jî civak bi wan qayîl dibe. Pêşniyar û rêbazên wan ên çareseriyê nav civakê de bê terdud tên qebûlkirin. Îsmaîl tekez kir: Em li pirsgirêkê nasekinin ku were ber destê me û çareser bikin, komîte mehane dusê caran serdana malbatan dike û rê li ber derketina alozî û pirsgirêkan digire. Ger hewce yan giliyek hebe, em mudexele dikin.

**RÊJEYA PIRSGIRÊKAN KÊM BÛYE**

Endama Meclîsa Giştî ya Lihevanîna Civakî li Kampa Berxwedan Narîman Ehmed Abdulah jî got: Li Kampa Berxwedan 14 komîn hene. Nav her komînekê lîcneya silhê heye. Têkildarî pirsgirêkên xweser ên jinê, di komîteyê de jinênê endamên Kongra Star hene. Beriya ku pirsgirêk bigihe ber destê meclîsa giştî, komîteyên nav komînan de mudexele dikin. Ger li wir neyên çareserkirin, dişînin meclîsê. Narîman wiha dirêjahî da gotinên xwe: Roja em hatin vir, bi giranî pirsgirêkên jin û mêr derdiketin. Lê piştî ku komîn, meclîs û saziyên rêxistina civakî ji nû ve hatin rûnişkandin, rêjeya pirsgirêkan jî kîmtir bû.
Herdu endamên Meclîsa Giştî ya Lihevanîna Civakî li Kampa Berxwedan, di dawiyê de tekez kirin ku; Bi kêmkirina alozî û pirsgirêkan re, çeperên Berxwedana Serdemê bihêztir dibin. Ancax bi riya rêxistinkirina civakê, hevdu temamkirinê, li ser bingeha exlaq û rayîşên civakî yên resen Efrînê bête rizgarkirin. Em çiqas pirsgirêkan kêmtir bikin, vegera Efrînê nêzîktir dibe.

# Girêdana jinên Dêrazorê bi çandiniyê re

Jinên Dêrazorê gelek destkeftî li ser asta çandiniyê bi dest xistine û di pêkanîna rêgeza xwetêrkirinê de rolek girîng dilîzin.
Di dema dagirkeriya DAIŞ’ê li ser herêmê de jin ji mafên xwe bê par man û azadiya wan bi darê zorê ji destê wan hat girtin. Lê piştî rizgarkirina herêmên Dêrazorê jinan xwe ji nû ve birêxistin kirin û carek din xwe bi xwe birêve birin.
Jinên herêmê ji bo pêkanîna rêgeza xwetêrkirinê û xwe bi xwe rêvebirinê, di nav zeviyan de dixebitin. Di havînê de berhemên weke milûxiye, bamî û hwd, diçînin û di zivistanê de di berhevkirina zeytûnê û gelek hilberînên din de dixebitin.
Têkildarî mijarê welatiya bi navê Zerha El-Casim a ku di nav zeviyan de dixebite diyar kir ku bi rêya karê xwe armanc dike ku rêgeza xwetêrkirinê pêk bîne û beyî alîkariya kesekî bixebite û wiha got: “Bi rêya karê xwe di zeviyan de em girêdana xwe bi çandiniyê û xwezayê re rave dikin.”...ANHA



şopdara rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 498 30-Mijdar- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Tirkiye ji Sûriyê venekişe, Şam wê serî li rêyên cuda bide

Nûnerê Sûriye yê NY’yê Beşar Caferî di hevdîtinên Sûriyê yê Astanayê de anî ziman ku eger dixwazin çareseriyekê ji bo Sûriyê pêk bînin divê Tirkiye hêzên xwe yên li Sûriyê vekişîne. Caferî diyar kir ku eger bi rêyên dîplomatîkî Tirkiye hêzên xwe yên li welat venekişîne, wê Şam serî li rêyên cuda bide. Caferî got, “Tirkiye çekên kîmyewî dane komên çekdar ên li Helebê çekên bi kîmyewî bikar anîne.” Caferî bibîr xist ku rewşa Îdibê ji ber Tirkiyê her diçe xirab dibe, anî ziman ku Tirkiye li vir erka dikeve ser milan bi cih nayne.” *R-2*

# TÊKOŞÎNA ŞÎLAN Û HEVREYÊN WÊ DIDOME



## BI SEDAN KESÎ BIBÎRANÎN

Meysa Baqî (Şîlan Kobanê) û 4 hevrêyên wê 29`ê Mijdara 2004`an li bajarê Mûsilê di encama komployekê de şehîd bûn. Bi boneya salvegera şehadeta wan li gelek bajarên Rojava û Bakurê Sûriyê merasîmên bîranînê hatin lidarxistin.
Bi vê armancê bi sedan welatiyên Dirbêsiyê û Tirbespiyê Şehîd Şîlan û hevrêyên wê bi bîr anîn.

## EM Ê LI SER ŞOPA WAN BIMEŞIN

Merasîma li Dirbêsiyê li Navenda Çand û Hunerê pêk hat û bi sedan kes beşdar bûn. Di merasîmê de behsa têkoşîna Şîlan û hevreyên wê hat kirin û hat diyar kirin ku wê li ser şopa wan têkoşîn berdewam bike. Li Tirbespiyê jî li Akademiya Şehîd Yekta Herekol merasîma bîranînê pêk hat û soza berdewamkirina têkoşîna wan hat dayîn. *R-2*

## Dixwazin di nav gelan de fîtneyan derxin




Hevserokê Meclisa Zagonsaz a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û gundewarê wê Farûq El-Maşî diyar kir dewleta AKP’ê bi hedefgirtina rûspiyan hewl dide aramî û ewlehiya li herêmê têk bibe. El Maşî bang li welatiyên Bakurê Sûriyê kir ku li hember derxistina fitneyan hevgirtin û yekîtiya xwe xurt bikin. *R-4*

## Duyemîn kongreya PYD`ê ya Helebê pêk hat



Rêxistina PYD’ê ya şaxê Helebê bi dirûşmeya “Bi rêveberî û bi rêxsitin em ê Efrînê rizgar bikin û Sûriyeke nemerkezî û demokratîk ava bikin” duyemîn kongreya xwe bi beşdariya 260 delegeyan li hola Efrîn a Şiqeyîf ya li bajarê Helebê li dar xist. Endamê Desteya Rêveber a TEV-DEM`ê Hesen Koçer di kongreyê de axivî û diyar kir ku lidarxistina kongreyê, ji bo birêxistinkirina endaman e. *R-4*

## Bakurê Sûriyê ji bo Tirkiyê fef nîne



Berpirsê Têkiliyên Diplomatik a PYD’ê Salîh Muslim, ku beşdari hevdîtinên Sûrî-Sûrî yên li Eyn Îsayê pêk hat bû, êrîşên dewleta Tirk li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriye nirxand û wiha got: “Em tu car nebûn dijminê gelên Tirkiyê. Tu carî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo gelên Tirkiye ne talûke û ne gef e. Em dê li dijî hemû êrîşan parastina xwe ya rewa bikin.” *R-4*


## Komîteyên lihevanînê pirsgirêkan çareser dikin

Komîteyên lihevanîn di çareserkirina doz û pirsgirêkan de bi roleke girîng radibin. Komîteyên Lihevanînê yên li Reqayê di vê mijarê de gelek xebatên girîng kiriye. Komîteyê Di nav 6 mehan de 500 doz ji bingeha 800 dozan çareser kiriye û ji bo 300 dozên mayî xebatên xwe berdewam dike. *R-6*



## Dewleta Tirk çareseriyê asteng dike

Danûstandinên Sûrî-Sûrî ku li bajarokê Eyn Îsa bi dirûşmeya “Danûstandinên ji bo avakirin û pêşxistina Sûriyê” hat lidarxistin. Hevseroka Herêma Efrînê Şîraz Hemo diyar kir ku aliyên beşdarî Danûstandinên Sûrî-Sûrî bûne, ji ber ku dewleta Tirk pêkanîna aştî û çareseriyê li Sûriyê asteng dike, xwestin ku dagirkeriya Tirkiyê li ser axa Sûriyê bi dawî bibe. *R-3*



## Tirkiye piştevaniya terorê dike

Êrîşên dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmên bakurê Sûriyê berdewam dikin. Endama Têkiliyên Dîplomasî ya Kongreya Star a bajarê Helebê Leyla Xalid diyar kir ku dewleta Tirk piştgiriya komên terorîst yên li Sûriyê dike û bang li hêzên navnetewî kir ku li hember dewleta Tirk bibin xwedî helwest. *R-3*

## Di derbarê çareseriya aloziya Sûriyê de pêşniyarên girîng



Danûstandinên Sûrî-Sûrî li navçeya Eyn Îsa, bi dirûşmeya “Danûstandin ji bo avakirin û pêşketina Sûriyê” hat lidarxistin. Komxebatê du rojan berdewam kir. Kesên ku beşdarê komxebatê bûn di der barê destûra pêşerojê ya Sûriyê û çareseriya aloziyê de de nêrîn û pêşniyarên girîng pêşxistin. *R-2*

## Li 6 bajaran greva birçîbûnê tê kirin




Çalakiyên li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dikin. Piştgiriya ji bo çalakiya grêva birçîbûnê ya Parlamentera HDP’ê Leyla Guven a li dijî tecrîdê berbelav dibe. Li 6 bajarên Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê ji bo 3 rojan; 2,3 û 4’ê Kanûnê li Stenbol, Enqere û Mêrsînê, 7-8-9’ê Kanûnê jî li Mûş, Şirnex û Mêrdînê , wê grêva birçîbûnê were destpêkirin. *R-5*

## Em ê serî li Dadgeha Federal a Iraqê bidin

Piştî ku li Herêma Kurdistanê YNK’ê çend navendên Tevgera Azadî girt, Berdevka Tevgera Azadî Tara Hisên eşkere kir ku wê serî li Dadgeha Federal a Iraqê bidin. Tara Hisên got, “Em hewl didin ku bi rêya dîplomasî çareser bikin. Di vê derbarê de gotubêj dewam dikin.” *R-3*

## Emê dosya Tevgera Azadî bibin Wezareta Hundirîn a Iraqê

YNK’ê li başûrê Kurdistanê bi ser gelek navendên Tevgera Azadî de girt û ew girtin. Parlamenterê Tevgera Goran ya Parlamentoya Iraqê Xalib Mihemed diyar kir ku wê dosya girtina navendên Tevgera Azadî bibin Wezareta Hundirîn a Iraqê. Parlamentera Tevgera Goran Şirîn Emîn jî diyar kir ku ev kiryar nayê qebûl kirin û divê li ber rabin. *R-4*

## Elmanya dixwaze welatiyên xwe yên DAIŞ’î bibe

Ji bo 35 welatiyên Elman (10 mêr, 10 jin, 15 zarok) ku di operasyon û pêngavên YPG’ê yên dijî DAÎŞ’e de bi saxî hatin girtin, ev demek bû ku bang li hikumeta Elman a federal a bi serokatiya Merkel dihate kirin. Hikumeta Elman a Federal ragihand, ji bo 35 DAÎŞ’iyên welatiyên Elman ên di destê YPG’ê de ne bînin Elmanyayê, ew hemû alternatîfan dinirxînin. *R-5*

# Şîlan û hevrêyên wê hatin bi bîranîn

**Meysa Baqî (Şîlan Kobanê) û 4 hevrêyên wê 29`ê Mijdara 2004`an li bajarê Mûsilê di encama komployekê de şehîd bûn. Bi boneya salvegera şehadeta wan bi sedan welatiyên Dirbêsiyê li li Navenda Çand û Hunerê ya Dirbêsiyê bi merasîmekê ew bi bîranîn. Di merasîmê de hat gotin ku ewê têkoşîna Şîlan û heverêyên bidomînin.**

Meclisa Malbatên Şehîdan a navçeya Dirbêsiyê Şîlan Kobanê û hevrêyên wê bi bîr anîn.
Bi sedan welatiyên navçeya Dirbêsiyê têkoşer Şîlan û her çar hevrêyên wê li Navenda Çand û Hunerê ya navçeyê bibîranîn.
Bi sedan şêniyên navçeyê û gundewarên wê, fermandar, şervanên YPJ/YPG'ê, bi dehan endam û rêveberên PYD`ê tev li merasîmê bûn.
Bi navê PYD`ê Naman Erebo salvegera 14`mîn a şehadeta têkoşer Şîlan Kobanê û her 4 hevrêyên wê bi bîr anî û got ew ê heta dawiyê şopdarên rêya wan bin. Erebo destnîşan kir ku têkoşer Şîlan û hevrêyên wê li ser destê kesên xayîn û ajanên dijmin şehîd bûn lê ew ê her tim di nava dîrokê de bimînin û bûne pêşengên gelê Kurd.
Bi navê Kongreya Star Ebîr Hesen di şexsê têkoşer Şîlan de hemû şehîdên şoreşê bi bîr anîn û soz da ku ew ê heta dawiyê şopdarên rêya şehîd Şîlan bin ku navê wê bi tîpên zêrîn di dîrokê de hatiye nivîsandin.
Meysa Baqî (Şîlan Kobanê) û 4 hevrêyên wê 29`ê Mijdara 2004`an li bajarê Mûsilê di encama komployeke navdewletî de şehîd bûn.



# Tirkiye ji Sûriyê venekişe, Şam wê serî li rêyên cuda bide



Nûnerê Herdemî yê Sûriye yê NY'yê Caferî anî ziman ku divê Tirkiye hêzên xwe yên li Sûriyê vekişîne. Caferî bal kişand ku Tirkiye çekên kîmyewî dane komên çekdar ên li Helebê çekên bi kîmyewî bikar anîne.
Nûnerê Herdemî yê Sûriye yê NY'yê Caferî anî ziman ku eger ku dixwazin çareseriyekê ji bo Sûriyê pêk bînin divê Tirkiye hêzên xwe yên li welat vekişîne. Caferî ragihand ku Tirkiye çekên kîmyewî dane komên çekdar ên li Helebê çekên bi kîmyewî bikar anîne.
Nûnerê Herdemî yê Sûriye yê NY'yê Beşar Caferî yê di hevdîtinên Sûriye ya li Astanayê de axivî, got: "Tirkiye li şûna bi çekên sivik erka xwe ya polîsiyê bi cih bîne, ji bo bajarên dikevin bakurê Sûriyê bi çekên giran û leşkeran tije kiriye. Li bajarên Sûriyê alên Tirkan tên rakirin. Ev kiryarên Tirkiyê bi awayekî ber bi çav wateya êrîşkariyê ne.
Caferî bibîr xist ku rewşa Îdibê ji ber Tirkiyê her diçe xirab dibe, anî ziman ku Tirkiye li vir erka dikeve ser milan bi cih nayne.

### EGER VENEKIŞIN, WÊ RÊYÊN CUDA BÊ DÎTIN!

Caferî yê têkildarî hêzên Tirkiyê yên li Sûriyê jî axivî, diyar kir ku eger bi rêyên dîplomatîkî Tirkiye hêzên xwe yên li welat venekişîne, wê Şam serî li rêyên cuda bide.
Caferî bibîr xist ku Tirkiye li gorî li hevkirina Soçî diviya bû bi erka xwe ya vekişandina çeteyan a li Îdilibê bikara, lê vê nake û got: "Ji ber vê yê hê jî terorîst li Îdlibê binpêkirinên xwe didomînin. Wan baweriya bi Tirkiyê ya me da kêmkirin."

### TIRKIYE ÇEKÊN BI KÎMYEWÎ DANE

Caferî bi domdarî got: "Tirkiye bi rêya rêxistinên terorî li Helebê çekên bi kîmyewî bikar anî." zêdebûn aloziya li Helebê tê wateya nepêkanîna berpirsyartiyên li Soçiyê hatine girtine.
Caferî got: "Niha şensê Tirkiyeyê heye ku hêzên xwe 20 kîlometreyan paşve vekişîne." Caferî diyar kir ku êrîşên bi çekên kîmyewî yên ji aliyê terorîstan ve li Helbê hatin bikaraîn di serî de ji aliyê Tirkiye û hêzên biyanî ve tê destekkirin. Caferî wiha nirxand: "Eger teroîstan ji aliyê hêzên tên destekkirin û tên kontrolkirin ve bikaranîna çekan nehatiba erêkrin, wan nedikarî çekên kîmyewî bikar bîne. Em baş dizanin kê çekên bi kîmyewî dane wan. Di serî de behsa Tirkan dikim."

### TIRKIYE DIVÊ HEMÛ HÊZÊN XWE VEKIŞÎNE

Caferî da nîşandan ku li gorî lihevkirina Soçiyê Tirkiye wê li herêmê 12 nuqteyên kontrolê ava bikira û wê çekên sivik bikar bianîba û got: " Li şûna vê 11 hezar kesên bi çek şande Sûriyeyê. Niha leşkerên Tirk li gelek bajarên welat bi cih bûne. Ev erkên xwe yên polîsî nakin, çekên giran û helîkopterên wan hene."
Caferî ev hişyarî kir: "Tirkiye eger dixwaze alîkariya Sûriyeyê bike, divê hemû hêzên xwe vekişîne. Di serî de divê hêzên xwe yên nerewa ketine xaka me vekişîne.." her wiha Caferî bibîr xist ku divê DYA û Fransa jî hêzên xwe yên li hinek herêman bi cih bûne jî vekişînin."
Nûnerê Herdemî yê Sûriye yê NY'yê Caferî da xuyakirin ku wê guşarên Rojava yên li ser Şamê jî rakin û ji bo vegera koçberan jî alîkarî bike.

# Koma 5'emîn çalakiya greva birçîbûnê dewir girt



Di roja 9'an de çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û dorvger ya Nûnertiya HDP'ê ya Herêma Kurdistanê ya li Hewlêrê ya li dijî tecrîdkirina Ocalan de, koma 5'emîn dewir girt.
Nûnertiya HDP'ê li Hewlêrê bi armanca rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgirîdayîna çalakiya Hevseroka KCD'ê û parlementera Colemêrgê Leyla Guven ji 21'ê Mijdarê ve çalakiya greva birçîbûnê daye destpêkirin. Çalakiya greva birçîbûnê ya li Hewlêrê bêdem û dorveger di roja 9'emîn de didome. Roja 29'ê vê mehê koma 5'emîn greva birçîbûnê dewir girt.
Endamê Nûnertiya HDP'ê ya Herêma Kurdistanê Kerîm Abid di dema dewirgirtinê de axivî û got; "Me li dijî tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan û ji bo piştgiriya Leyla Guven dest bi grevê kiriye. Heta ku tecîdkirina Rêber Apo berdewam bike û parlameterên me li girtîgehê de bin wê û ji Rêber Apo agahiyan negirîn wê greva me berdewam bike."
Çalakiya greva birçîbûnê ya Nûnertiya HDP'ê ji 21'ê Mijdarê ve destpê kiriye. Heta niha 5 koman dewir girtiye. Her komek 2 rojan di grevê de dimîne…***ROJNEWS***

# YPG'ê nasnameyên 10 şervanan eşkere kir



YPG'ê nasnameya 10 şervanên di Pêngava Bagera Cizîrê ya 'Şerê Tinekirina Terorê' de li Dêra Zorê û şervanekî li Holê di encam êrîşekî sekvaniyê de şehîd bûbûn, eşkere kir.
YPG'ê bi daxuyaniyekê nasnameya 10 şervanên di êrîşa 24'ê Mijdarê ya di Qonaxa Dawî ya Pêngava Bager Cizîrê ya 'Şerê Tinekirina Terorê' ya li Dêra Zorê û şervanekî li Holê di êrîşekî sekvaniyê de şehdî bûbûn, eşerek kir.
"Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) di bin pêşengtiya hêzên YPG/YPJ de di çarçoveya pêngavê de derbên giran li çeteyan didin û ber bi Hecînê ve pêş ve diçin. DAÎŞ a li ber tunebûnê ye, bi armanca ku qada dawî ya ku di Sûriyê de kontrol dike winda neke bi her cûreyî rêbazan êrîş dibe ser şervanan. Li hember van êrîşên ku di nav de wesayîtên bombebarkirî, sûdwergirtina rewşa hewayê ya xerab û her wekî din êrîşên întîxarî jî hene. Şervanên Hêzên Sûriya Demokratîk bi lehengane liberxwe didin û êrîşan vala derdixin. Di dîroka 24'ê Mijdarê de çeteyên DAÎŞ'ê ji rewşa hewayî jî sûdwergirtin û êrîşeke berfireh birin ser çeperên hêzên me yên li eniya bakûr rojavayê Hecînê da ku pêşiya pêşveçûnên hêzên me bigrin. Li dijî êrîşên çeteyan bersivdana hêzên me ve şerê dijwar di vê herêmê de qewimîn. Di şerê çend saet dom kir de êrîşên çeteyan bi temamî hat têkbirin. Di şer de derbên giran li çeteyan hat xistin û çete neçar man ku paş de birevin. Di têkbirina êrîşên çeteyan de 10 hevrêyên me bi lehengî şerkirin û gihîştine şehadetê."

# Di derbarê çareseriya aloziya Sûriyê de pêşniyarên girîng



Kesên ku tev li Danûstanên Sûrî-Sûrî bûne, di nirxandinan der barê destûra Sûriyê ya heyî û avakirina destûreke nû de pêşniyarên xwe kirin.
Danûstandinên Sûrî-Sûrî ku li navçeya Eyn Îsa, bi dirûşmeya "Danûstandin ji bo avakirin û pêşketina Sûriyê" di roja xwe ya duyemîn de bi dawî bû. Di beşa duyemîn a nirxandinan de beşdaran der barê destûra pêşerojê ya Sûriyê de pêşniyarên xwe kirin.
Pêşniyarên ku ji aliyê beşdaran ve hatine kirin, wiha ne:
- Destûreke nû ji bo Sûriyê were avakirin û mafên hemû pêkhate, ol û mezheban biparêze.
- Kesên ku xwe ji bo serokatiya Sûriyê pêşniyar bikin, ne pêwîst e misilman bin, bi tenê welatiyên Sûriyê bin.
- Girêdayî mijara jinan, divê jin û mêr wekhev bin, ji bo maf, piştgirî û pêşketina wê bê ferq û cudatî destûr werin danîn.
- Welatiyên li Sûriyê divê li gorî nasnameya xwe werin naskirin, ne li gorî hemwelatîbûna Erebî.
- Navê Komara Erebî El-Sûriye, bibe Komara El-Sûriye.
- Şeklê destûra Sûriyê bi erêkirina gelê Sûriyê çêbe û destwerdanên ji projeyên derve ku dewletên derve pêşniyar dikin, çênabe. Rengê destûra Sûriyê divê li gorî daxwazên gelê Sûriyê be.
- Destûra heyî li Sûriyê parastina desthilatdariya heyî (desthilatdariya Baasê) dike, ew mafê gelê Sûriyê naparêze.
- Hemû zimanên pêkhateyên Sûriyê wek zimanên sereke bên qebûlkirin.



# Nahêlin Filmê 14'ê Tîrmehê were pêşandan

**Fîlma 14'ê Tîrmehê ku li ser Berxwedana Pêşengên PKK'ê yên li dijî hovîtiya dewleta Tirk a li zîndana Amedê ku bi eleqeyeke mezin tê temaşekirin li Silêmaniyê ya Başûr rastî astengiyan tê. Biryar bû ku di 1'ê Kanûnê heta 7'ê Kanûnê li Sînemaya Salim a Silêmaniyê were pêşandan, lê ji aliyê asayîşa giştî ya Silêmaniyê ve pêşandana wê hate astengkirin.**



Filmê 14'ê Tîrmehê ya li ser berxwedana pêşengên PKK'ê yên li Girtîgeha Amedê biryar bû ku di 1'ê Kanûnê heta 7'ê Kanûnê li Sînemaya Salim a Silêmaniyê were pêşandan, lê ji aliyê asayîşa giştî ya Silêmaniyê ve pêşandana wê hate astengkirin.
Biryar bû ku li Sînemaya Salim a Silêmaniyê di 1' Kanûnê de Filma 14'ê Tîrmehê ya li ser berxwedana 14'ê Tîrmehê ya Girtîgeha Amedê ku Haşim Aydemîr derhêneriya wê kiriye were pêşandan, lê Rêveberiya Sîmeya Salim bi daxuyaniyekê eşkere kir ku Asayîşa Silêmaniyê rê nade film were pêşandan. Rêveberiya Sîmeya Salim daxwaz ji Wezareta Rewşenbîrî, Walîtiya Silêmaniyê û Rêveberiya Rewşenbîrî ya Silêmaniyê kir ku rewşê zelal bikin.
Piştî ku filmê 14'ê Tîrmehê beşdarî festîvala Filman a Silêmaniyê bû, li ser daxwaza gel wê film ji 1'ê Kanûnê ve li Sînemaya Salim a Silêmaniyê bihata pêşandan, ji bo destûra fermî hatibû dayîn were pêşkêşkirin, lê niha Asayîşa Silêmaniyê bêyî ku sedemekê eşkere bike temaşekirina film asteng dike.
Di daxuyaniya Sînemaya Salim a ku li ser hesabê wê yê tora civakî hatî parvekirin wiha tê gotin; "Ji aliyê asayîşa giştî ya Silêmaniyê ve bi me re peywendî hate kirin û ji me re gotin ku, 'Bi ti awayî rê nadîn film were pêşandan'. Her çiqas me daxwaza nivîsa fermî kir. Lê bersiv nedan. Tenê gotin ku 'serê xwe neêşînin' ji ber ku qet rê danîn ev film were pêşandan. "
Rêveberiya Sînemaya Salim işaret bi van metirsiyan dike; "Kînekî eşkere ya li hemberî azadiya ragihandinê ye. Ji derveyî sansurekî zelal tiştekî din nîne. Ev sansur carek nivîskar û rojnamegeran dikuje û carekê jî filmê şoreşgeran sansur dike. Em planên navneteweyî yên bi pêşengiya Tirkiye, Amerîka û welatên bi hêz ên li dijî beşek ji xebata azadîxwaz û neteweya xwe fêm dikin. Di berdewamkirina vê de, êrîşên weke beşek ji dîroka nokerî û teslîmbûna desthilata xwemalî ya ji bo razîkirina dagirkeran fêm dikin. Em di wê baweriyê de ne ku li dijî îradeya gelê Kurd û hemû xebata bi salane li Başûrê Kurdistanê bi sedan şehîd dane ye. Bi taybet ji bo razîkirina dagirkerane. Herwiha timî desthilatdar ji huner û çalakiyên çandî ditirse. Divê Wezareta Rewşenbîrî, Rêveberiya Giştî ya Rewşenbîriya Silêmaniî û Waliyê Silêmaniyê ku berpirsê yekem ê vî bajarî ye helwest nîşan bidin û mijarê zelal bikin. Vê ew biryar rewşa me du qat din girantir bike. Wê ev biryar bandoriyê li hemû civakê bike. "





### FÎLMA 14'Ê TÎRMEHÊ

Filmê berxwedana 14'ê Tîrmehê ku derhêneriya wê Haşim Aydemîr dike, li ser berxwedana kadroyên pêşeng yên PKK'ê, welatparêzên Kurd û şoreşgerên Tirkiyê ya li dijî zilm û hovîtiya dewleta Tirk li beramber girtiyên li Girtîgeha Amedê kirine, hatiye çêkirin.
Filmê rojiya mirinê ya berxwedana 14'ê Tîrmehê heya niha beşdarî çend festîvalên film ên navnetewî û herêmî bûye û di çend qadan de jî hêjayî xelatê hatiye dîtin. Filmê ku berxwedana şoregerên Kurd û Tirkiyê ya li dijî hovîtiya dewleta Tirk kiriye mijara xwe, li festîvalên film a Hindistan, Almanya, Brîtanya, Polonya, Silêmanî û Dihok'ê de (filmên dokumenterî) hatiye nîşandan.
Herî dawî jî di festîvala filmên navnetewî ya Silêmanî de xelata rêzgirtinê girt û yegane film bû ku li ser daxwaza zêde ya bîneran du caran hate nîşandan. Di qada aktoriya herî baş û derhêneriya dîmen jî hêjayî xelatê hatiye dîtin.
Amadekariyên filmê berxwedana 14'ê Tîrmehê di sala 2014'an de destpê kir û di sala 2015'an de dest bi kişandina film hate kirin.
Di sala 1980'an de dewleta Tirk li dijî hemû derdorên mûxalif, şoreşgerên Kurd û Tirk û sosyalîstan darbeya 12'ê Îlonê pêkanî. Bi hezaran kes girt û di êşkenceyên mezin re derbas kir û hovîtiyeke mezin pêkanî. Ev hovîtiya dewleta Tirk a bi taybet li zîndana Amedê, di sala 1982'an de gihîşt lûtkeyê. Kadroyê pêşeng yê PKK'ê di 21'ê Adarê de li dijî hovîtî û faşîzma dewleta Tirk starta berxwedanê da. Piştre şoreşgerên Kurd û Tirk yên PKK'yî berxwedana rojiya mirinê dan destpêkirin. Heya niha gelek filmên dokûmenterî û stran li ser berxwedana 14'ê Tîrmehê hatine derxistin…***ROJNEWS***

# Kêfa Kurdan wê ji Rock a Kurdî re were

Hunermendê Kurd Diljen Ronî ku bi rêbaza Pop-rock distirê, albûma bi navê "Xewna Derew" pêşkêşî guhdaran kir. Diljen Ronî got, "Kurdan dema ku li Rock a Kurdî guhdarî kirin wê kêfa wan jê re bê, ji ber ku bi zimanê wan ê dayikê ye."
Albûma nû ya hunermendê Kurd Diljen Ronî "Xewna Derew" ji Kom Muzîkê derket. Albûm ji stranên pop-rockê pêk tê. Ronî, berhema 'Sînê' ya solîstê Koma Wetan Kerem Gerdenzerî ji nû ve şîrove kir. Her wiha strana "Ez û Yar" a Cegerxwîn ku muzîka wê Hozan Dilgeş çêkir, xwend.
Albûma "Xewna Derew" ji 9 stranan pêk tê û gotinên 4 ji wan ji aliyê Ronî ve hatine nivîsandin. Muzîka 7 stranan jî aliyê wî ve hatiye çêkirin. Diljen Ronî ji ANF'ê re qala hunera xwe kir.
Ronî diyar kir, di muzîka Kurdî de zêde rêbazên cihê nînin û got, "Ev yek kêmasî ye. Kêm mirov hene ku muzîka rockê çêdike. Yek ji van Ciwan Haco ye. Ez heyranê wî me. Lewma dibe ku ji ber vê yekê dengê min dişibînin yê wî. Lê ev rêbaz rêbaza min e û bi vî rengî hîn bi hêsanî distirêm."



### DIVÊ MIROV LI POP Û ROCK A KURDÎ VEKIRÎ BIN

Diljen Ronî diyar kir, di navbera konjonktura salên 90'î ya niha de gelek cudahî hene û wiha dewam kir: "Divê mirov niha muzîkên hîn baştir derxînin. Pêwîstî bi avabûna bazara vê heye, ji ber ku pirsgirêka herî mezin a stranbêjên Kurdî ew e ku berhemên xwe nikarin bigihînin gel."
Ronî anî ziman ku mîsyona wî ya herî mezin e ew e ku bêje, 'Li şûna Kurd li pop a Tirkî guhdarî bike bila li Pop a Kurdî guhdarî bike. Li şûna ku li Rock a Tirkî guhdarî bikin bila li Rock a Kurdî guhdarî bikin'. Bi vê armancê min berhem afirand. Kurdan dema ku li Rock a Kurdî guhdarî kirin wê kêfa wan gelekî jê re bê, ji ber ku bi zimanê wan ê daykê ye. Lewma divê mirov li vê rêbazê vekirî bin."

### XEWNA DEREW' BÛ NÎŞANEYA WÎ

Diljen Ronî diyar kir, wî albûma xwe ya destpêkê ya bi navê "Çend Gotinên Evînê" li Cizîrê amade kir û got, "Ji ber ku albûma destpêkê bû berpirsyariya min giran bû. Ya rast, rêbaza min pop-rock e. Bi vê rêbazê xwe hîn bi hêsanî dikarim îfade bikim. Lê belê ji ber ku aliyekî min Botanî ye, ez bi stranên wê derê mezin bûm. Di bingeha hunera min de şopa Mehmed Arîf Cizîrî xurt e. Bêguman derfetan jî bandor li rewşê kir. Piştî ku min got 'Ez êdî amade me' min dest bi afirandina rêbaza xwe kir.
Min li qeydên li stranên gelêrî yên Kurdî yên malê, li konserê ya jî li devereke din hatine kişandin guhdarî kir û dûre biryar da ku albûma Klasîkê Kurdî derxînim. Ji bo li muzîka Kurdî ya klasîk bê, min bi hemû detayan di wê formatê de xwend. Lê ev albûm nîşaneya min e. Dema ku Diljen Ronî were gotin wê albûma Xewna Derew bê bîra mirovan. Ji ber ku albûmên min ên ji niha û pê ve wê mîna vê bin."

### NAVEROKA ALBÛMÊ

Li ser naveroka albûma "Xewna Derew" Ronî got: "Gotinên 3 stranên albûmê yên Muslum Aslan e." Ronî diyar kir di albûmê de ew bi bas gîtarîstê navdar Îsmaîl Soyberk, mûzîsyen û aranjor Ayhan Orhûntaş û Alper Atakan ku aranjorî ji gelek stranbêjên muzîka pop a Tirkî re kiriye, xebitiye.
Diljen Ronî sala 2008'an bi albûma xwe ya bi navê "Çend Gotinên Evînê" navê xwe da naskirin. Piştre sala 2012'an albûma "Du Demsal" û asla 2018'an jî "Çile-Klasîkên Kurdî" pêşkêşî guhdaran kir.

# Rola Komîteyên Lihevanînê

**Komîteyên lihevanîn di çareserkirina doz û pirsgirêkan de bi roleke girîng radibin. Komîteyên Lihevanînê yên li Reqayê di vê mijarê de gelek xebatên girîng kiriye. Komîteyê Di nav 6 mehan de 500 doz ji bingeha 800 dozan çareser kiriye û ji bo 300 dozên mayî xebatên xwe berdewam dike.**



Komîteyên lihevanînê yên bajarê Reqayê zêdetirî 500 doz di nav 6 mehan de çareser kirine û hewl didin di çareserkirina dozan de rêgeza edaleta civakî pêk bînin. Têgeha dadgeh û edalet, wateyek cuda li Rojava-Bakurê Sûriyê digire. Ji bo bicihanîna edaletê û xurtkirina dada civakî û lihevanîna aşitiyane li şûna qanûnên hişk û têgeha cezayê, civak tev li vê xebatê dike.
Li ser vê bingehê komîteyên lihevanînê doz û pirsgirêkên civakî bi rêya lihevanîn û razîbûnê çareser dikin.
Gelek sazî hatin avakirin di nav de meclisên herêmî yên ku jê komîteyên lihevanînê derketine. Erka wan komîteyan çareserkirina doz û giliyên civakî bi razîbûna her du aliyan, dûrî dadgehan e. Meclis ku hatine avakirin ev in: Rimêle, El-Mişleb, El-Intîfada û El-Teyar.
Komîteyan xebatên xwe bi çareserkirina dozên berê û yên nû ji bingeh ve û bi girtina nêrîna her du aliyan dimeşîne.
Komîteyên lihevanînê yên girêdayî meclisên herêmî li bajarê Reqayê ji 7 endaman xwedî tecrube û exlaq û di nav gel de tên pejirandin pêk tên.
Pirraniya dozên ku tên cem komîteyan, nakokiyên zeviyên çandiniyê, avahî û mîrat in. Di nav 6 mehan de komîteyan 500 doz ji bingeha 800 dozan çareser kirine û ji bo 300 dozên mayî dixebite.
Têkildarî mijarê Serokê Komîteya Lihevanînê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê Mistefa Ismaîl got: "Ji bo misogerkirina mafên her du aliyên dozê em hewl didin dozan bi razîbûna her du aliyan çareser bikin. Her wiha di çareserkirina dozan de urf û adetên civakî di ber çavan re tên derbaskirin. Divê em rola şêx û rûspiyên herêmê di çaraserkirina dozan de ji bîr nekin û bi taybet dozên tolhildanê yên ku ev bûye çend sal û nehatine çareserkirin."
Di berdewama gotinên xwe de Mistefa Ismaîl ev tişt anî ziman: "Di nav 6 mehan de 800 dozên cuda hatin gel komîteyan û komîteyan 500 doz ji wan dozan çareser kiriye û ji bo çareserkirina yên mayî dixebite."
Girêdayî dozên ku komîteyan veguhestina Meclisa Dîwana Dada Civakî û aliyên têkildar Mistefa wiha got: "Pirraniya dozên ku li gel komîteyan nayin çareser kirin ji dadgehê re tên şandin."…*ANHA*

# 17 milyon lître mazot hatiye belavkirin



Saziya Sadkopê ya sotemenî li Dêrazorê di nav sê mehan de 17 milyon û 590 hezar û 591 lître mazot li şêniyên gundewarên rojhilat û rojava belav kir.
Saziya Sadkopê hewl dide hewcedariya hemû şêniyên herêmê yên mazotê bi cih bîne. Tê payîn ku piştî bidawîkirina xebatên belavkirina mazotê li gundan wê dest bi beşa duyem a belavkariyê bê kirin.
Sahrîcên girêdayî saziyê, rojane di nav gund û bajarokên gundawarên rojhilat û rojava de ji herêma El-Cizirat û ta bajarokê El-Besîra û gundên derdorê digere û mazot li şêniyan belav dike.
Xebatên belavkirinê li gorî navên gundan û bajarokan ku berê hatine amadkirin û bi rêzê li ser stasyonên herêmê tên belavkirin da ku her gundek para xwe bibe. Ev belgeyên navan bi rêya komînan hatine amadekirin.
Şêniyên herêmê xwe di nav komînan de birêxistin kirine da ku hemû pêdivî û daxwazên xwe bi cih bînin.
Para her malbatekî ji mazotê 200 lître mazot e. Buhaya lîtreya mazotê 55 lîreyên Sûriyeyê. Satkop lîtreya mazotê bi 55 lîreyan difroşe lê lîtreya mazotê di bazarê de jî bi buhayê 90-100 lîreyê suriyê tê firotin. Ji ber wê jî gel dibeje ku nirxê ku satkopê diyar kiriye guncave û mazotê ji satkopê dikirin.
Miqdara mazotê ku hatiye belavkirin ev e: Di Îlonê de 3 milyon lître, di Cotmehê de 6 milyon û 291 hezar lître û di meha Mijdarê de 8 milyon û 299 hezar û 591 lître.
Miqdara ku li jor hatiye destnîşankirin li gundewarê rojavayê Dêrazorê El-Cezre, Hermûşiye, El-Kersa, El-Sewa, Hemmar El-Lî, El-Zigîr, El-Hewayêc El-Hîsan, Mihêmîde, Şeqra û Miêzîle hatiye belavkirin.
Her wiha li gundewarê rojhilatê Dêrazorê Sewer, El-Xabûr, El-Sebha, Berîhe, Şehîl, Xeranîc, Zîban, El-Cezrî û Riwêşid mazot hatiye belavkirin…*ANHA*

# Li Tebqayê tûrnûvaya satrancê destpê kir

li Tebqayê bi tevlêbûna 40 lîstikvanan turnûvaya satrancê destpê kir.
Yekitiya Werzîşê ya Tebqayê bi hevkariya Meclisa Ciwanên Tebqayê turnûvaya satrancê bi navê 'Şehîd Ebdulkerîm Tebqa' orgenîze kir. Turnovayê li bajarê Tebqayê bi tevlêbûna 40 lîstikvana (zarok, jin û mêr) destpê kir.
Tunûvayê li navenda Şehîd Hanî ya Meclisa Ciwanên Tebqayê bi deqeya rêzgirtin destpê kir. Tevî hezkiriyên satranc, serokê Partiya Pêşerojê ya Sûriyê şaxê Tebqayê û endamên buroya werzîşê beşdarî çalakiyê bûn. Paşê serokê Partiya Pêşerojê ya Sûriyê şaxê Tebqayê Musna Ebdulkerîm axivî turnûva pîroz kir û diyar kir ku ev gav wê bibe destpêka vejandina gelek lîstikan û bi taybet ên hizrî.
Piştre Musna Ebdulkerîm bi rêya peşkê navên lîstikvanan diyar kir. Hejmara lîstikvanan 40 e û di dewreya yekemîn de wê 20 lîstokvanên serkeftî ji hemû çînên lîstokê derbasî dewreya dawîn bibin.
Turnûva wê heta roja Yekşema bê bidome. Di dewreya dawîn de wê ji her çînekî du lîstokvan li beramberî hev bilîzin. Her wiha sê lîstokvanên serkeftî yên destpêkê wê werin xelatkirin.
Li gorî endamê rêveber ê lîstokên tekekesî yê Yekîtiya Werzîşê yê Tebqayê Mehmûd El-Yetîm hejmara kesên ku xwe di turnovayê de tomar kirine gelek pir e. Ji ber wê neçar mane beriya destpêkirina turnûvayê, lîstikvanan di ezmûnan re derbas bikin û yên herî baş bipejirînin…*ANHA*



RAMANÊ RÊBERTIYÊ



## Ratiya Kurd -1-

Abdulah Ocalan

Hebûn û serwextî (şiûr-bîrbirin) pirsgirêka herî bingehîn a felsefeyê ye. Têgîna hebûnê hê jî yek ji têgînên sereke yên felsefeyê ye ku dibe mijara kakûnî û meraqê. Li ber serê vê têgînê cêwiya wê zeman heye. Herdu ji hev cuda nabin. Herçiqasî hebûn bêzeman nebe, zeman jî bêyî hebûn nabe. Zeman bi temamî bi hebûnê re têkildar e. Têkiliya di navbera herduyan de herî zêde bi têgîna bûyînê re heye. Hebûn û zeman ji sedî sed bi bûyînê pêk tên. Zeman di hebûnê de zorê dide bûyînê. Ya rastî, domdariya hebûnê bi bûyîn û qewimînê pêkan e. Em dema behsa hebûna di rewşa bûyîn û qewimînê de dikin zeman derketiye holê. Eger bûyîn hebe, li deverekê du çîçekên cuda hebin, li wir hebûn û zeman heye. Tinebûna bûyîn û qewimînê tê maneya tinebûna hem hebûnê hem jî zemanî. Bûyîn û qewimîn, rewşa hebûnê ya cudabûn û şêwegirtinê ye. Hebûna ne di rewşa bûyînê de ne hebûn e, zemanê tineye.
Rewşa bûyîn û cudabûnê, rewşa serwextbûnê ya xwedî potansiyel e. Cudabûn belkî jî gava pêşî ye ku ber bi serwextbûn û bîrbirinê ve tê avêtin. Kengî hebûn bi zeman re cuda bû, hingê serwextî û bîrbirin gava xwe ya pêşî diavêje. Çiqasî bûyîn, form û şêwe (hemû di heman maneyê de ne) hebin ewqasî jî serwextî û bîrbirin heye. Di çarçoveyeke gerdûnî de serwextî cudatî ye, serwextî jî weke kategorî rewşa giştî ya gerdûnî ya tevahiya serwextbûnên cudabûyî ye. Lê bêdawîbûna di forman de tê wê maneyê serwextbûn û bîrbirin jî bêdawî ne. Çiqasî formên cuda hebin, ewqasî jî serwextbûn û bîrbirinên cuda hene. Têgîna serwextbûnê (giyan) ya li cem Hegel beriya formê tê. Ya rastî, behsa serwextbûn û bîrbirineke bêform û şêwe tê kirin. Hegel, formê ji fizîka xwezayê dide destpêkirin heta bi dewletê dibe. Serwextbûn bi rêya forman xweber (bêform) dixwaze ji bo xwe li xwe serwext bibe. Serwextbûn û bîrbirin bi formên fizîkî, biyolojîk û civakî hem xwe piştrast dike, hem jî xwe nas dike. Serwextbûn û bîrbirina li cem mirov ew serwextbûn û bîrbirinek e ku li xwe hayil dibe. Serwextbûna felsefî rewşa serwextbûnê ya herî pêşketî ye; weke giyana (serwextbûna) li xwe hayilbûyî li rewşa xwe ya pêşî vedigere; lê bi awayekî li xwe hayilbûyî ango weke giyana mutleq. Em ji vê re dikarin serhatiya hebûn û zeman jî bibêjin. Di civakên Rojhilat de mirov zêdetir bi baweriyên dînî û tesewifê gihiştine vî şêweyê fikrê, lê civaka Rojava bi rêya zanist û felsefeyê xwe gihandiyê.
Ji bo mijara me ya girîng ew e, em têkiliya di navbera bûyîn-hebûn-serwextbûnê de zelal bikin û maneyê bidinê. Dema ku mijar Kurd bin, mirov ê karibe ji têgînên hebûn, bûyîn û serwextbûnê (bîrbirinê) gelek tiştan hîn bibe. Eger em Kurdan bi rewşa wan a hebûn, bûyîn û serwextbûnê bidin naskirin, ev yek wê ji bo fêhmkirina mijarê bibe bingeh. Ne dûr, heta beriya demekê, li gorî gelek civak û dewletan hebûna Kurdan cihê guftûgoyê bû. Di van du-sed salên dawiyê de ji bo piştrastkirin û îspata hebûna Kurdan, di çarçoveya moderniteya kapîtalîst de, belkî bi qasî Kurdan ti civak ewqasî li şîddetê rast nehatibe, ji aliyê naverok û şêweyê ve zordestî, înkar û îmha nedîtibe. Li ser Kurdan siyasetên qirkirinê yên fizîkî û çandî hatin meşandin. Li mekanê xwe yê esas (Kurdistan), çi ji aliyê fizîkî ve, çi jî ji aliyê çandî ve (zêhnî) hatin parçekirin û ji bo bêne tinekirin her cure amûrên zorê û îdeolojîk hatin seferberkirin. Mirov dikare bibêje, heta gihişt qirkirina bi destê moderniteya kapîtalîst, ti mekanîzmayên talan û zorê neman ku li ser nehatibin ceribandin. Kurdîtî ji vî alî ve diyardeyek wisa ye ku hemtayê wê nîne. Cihû ji bo qirqirinên xwe têgîna 'bêhemta, nedîtî, yekane' bi îhtîmam bi kar tînin. Ji bo Kurdan jî ne ku bi sedema qirkirina li ser wan meşandine, lê ji ber tevahî kirinên ew ji hebûnê derxistine mirov dikare gotina 'gelê yekane' yan jî 'yekane hebûna civakî ' bi kar bîne di cih de ye.



# Dewleta Tirk çareseriyê asteng dike

**Danûstandinên Sûrî-Sûrî ku li bajarokê Eyn Îsa bi dirûşmeya "Danûstandinên ji bo avakirin û pêşxistina Sûriyê" hat lidarxistin. Hevseroka Herêma Efrînê Şîraz Hemo diyar kir ku aliyên beşdarî Danûstandinên Sûrî-Sûrî bûne, ji ber ku dewleta Tirk pêkanîna aştî û çareseriyê li Sûriyê asteng dike, xwestin ku dagirkeriya Tirkiyê li ser axa Sûriyê bi dawî bibe.**



Hevseroka herêma Efrînê Şîraz Hemo diyar kir ku aliyên beşdarî Danûstandinên Sûrî-Sûrî bûne, dagirkeriya Tirkiyê li ser axa Sûriyê red dikin, ji ber ku dewleta Tirk pêkanîna aştî û çareseriyê li Sûriyê asteng dike.
Danûstandinên Sûrî-Sûrî ku li bajarokê Eyn Îsa bi dirûşmeya "Danûstandinên ji bo avakirin û pêşxistina Sûriyê" hat lidarxistin.
Di danûstandinan de mijara dagirkirina Efrînê, yek ji mijarên sereke bû. Beşdaran dagirkeriya Tirkiyê li Efrînê û xaka Sûriyê re red kir û xwestin ku dewleta Tirk ji xaka Sûriyê derkeve.
Li ser vê mijarê hevseroka herêma Efrînê Şîraz Hemo wiha axivî: "Di Danûstandinên Sûrî-Sûrî de diyar bû ku hemû aliyên opozîsyon û partiyên siyasî ku beşdarî danîna pêşniyarên dîtina çareseriya aloziya Sûriyê bûne, dagirkeriya Tirkiyê li Efrînê û hemû herêmên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê red dikin û diyar kirin ku destwerdan û dagirkeriya Tirkiyê yek ji sedeman e ku temenê aloziyê dirêj dike û rêya çareserî û aştiyê asteng dike."
Li ser nîqaşên ku di danûstandinan de li ser rewşa Efrînê hatin kirin, Şîraz Hemo destnîşan kir ku Efrîn rastî her cure şîdet, kuştin û koçkirinê ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê ve tê û got, "heta niha gelê Efrînê yê li Şehbayê li ber dagirkeriyê li ber xwe dide û berxwedana Efrînê da xuyakirin ku kes nikare nasnameya gelê Efrînê biçewisîne. Çawa Kobanê tola xwe ji DAIŞ`ê rakir, wê Efrîn jî tola xwe ji dagirkeriya Tirkiyê hilîne."
Hevseroka Herêma Efrînê Şîraz Hemo da xuyakirin ku aliyên beşdarî Danûstandinên Sûrî-Sûrî bûne, dagirkeriya Tirkiyê li Efrînê û herêmên din ên Sûriyê red kirin û ji civaka navdewletî û rêxistinên mirovî û navdeweletî xwestin li hember dagirkeriyê tev bigerin, zilma li ser wlatiyên Efrînê rakin. Şîrazê diyar kir ku mayîna Tirkiyê di Sûriyê de rêya çareserî û aştiyê asteng dike…*ANHA*

# Tirkiye piştevaniya terorê dike



Nûnera Têkiliyên Dîplomasî ya Kongreya Star Leyla Xalid bang li rêxistinên hiqûqî yên navnetewî kir ku bi berpirsyariyên xwe rabin û dewleta Tirk ji ber binpêkirinên wê yên li Suriyê yên li dijî mafê mirovan û bi taybet jî yên li dijî jinan darizînin.
Êrîşên dewleta Tirk a dagirker li dijî herêmên bakurê Sûriyê berdewam in. Dewleta Trirk bi wan êrîşan welatiyên herêmê û bi taybet jin û zarokan dike hedef.
Endama Têkiliyên Dîplomasî ya Kongreya Star a bajarê Helebê Leyla Xalid li ser mijarê ji axifî û diyar kir, dewleta Tirk a ku li Bakurê Suriyê zarokan di kûje di her warî de jî piştevaniya komên terorîst dike.
Leyla wiha dewam kir: "Em hemû dizanin ku Tirkiye lî Suriyê piştgiriyeke mezin dide komên terorîst. Ew bavê terorê ye. Binpêkirin û kirinên wê yên li Efrînê ku ji kuştin, talankirin, revandin û wêrankirina milkên welatiyan pêk tê bi serê xwe isbata vê rastiyê ye. Tirkiye û hevalbendên xwe niha jî hewl didin ku şer û terorê bi awayekî berfirehtir li her derê belav bikin."
Di berdewama gotinên xwe de Leyla ev tişt anî ziman: "dewleta tirk bi her şêwazê êrîşan dike. Li ser herêmên Bakurê Suriyê planan li pêş dixe, li dijî gel bi her şêwazê kiryarên qirêj pêk tîne. Mînak li ser jinê kiryarên wek; destavêtin, tundî, kuştinan pêk tîne lê dîsa jî dewletên derve û rêxistinên mirovî yên ku îdia dikin ku ew mafên mirovan diparêzin li hember wê bêdeng in."
Leylayê bang li rêxistinên hiqûqî yên navnetewî û rêxistinên mafê jinan kir ku ji bêdengiya xwe derkevin û bi erkên xwe li hember gelê Bakurê Sûriyê û jina rabin û dewleta Tirk şermezar bikin.
Leyla Xalid gotinên xwe wiha bi dawî kir: "Jinên Bakurê Sûriyê li ser rêgeza neteweya demokratîk xwe birêxistin kirine û îro em li ser esasê azadiya jinê dijîn. Ji lew re Tirkiye neghişt armancên xwe."…*ANHA*

# YJK-E ji bo meşa 1'ê Kanûnê bang kir



Tevgera Jina Kurd a Elmanyayê (YJK-E) banga tevlêbûnê li meşa 1'ê Kanûnê ya li Berlînê kir, ku meş li dijî qedexeya li ser PKK'ê û li dijî nîjatperestiyê wê were kirin.
Meş bi dirûşma, ''Daxwaza azadiyê nikare were qedexekirin- li dijî yasaya polîsan, qedexeya li ser PKK'ê û miletgiriyê têkoşîna hevpar'' wê were kirin.
Li gorî YJK-E'yê ''Wê bibe platforma Kurdên li Elmanyayê, hêzên enternasyonal, demokrat û femînîst bi hev re daxwazên azadî û demokrasiyê vebêjin.''
YJK-E'yê bal kişande ser qedexeya li ser PKK'ê ya li Elmanya ku ev 25 sal in didome, got, li gel zext û krîmînalîzaasyona bi dehan salan têkoşîna azadiya Kurd marjînalîze nebûye.
YJK-E'yê got, ''Berevajî, projeya Konfederalîzma Demokratîk a PKK'ê û Rêbertî ku bi pêvajoyê re geş bû sînorên Kurdistanê derbas kirine, li Elmanya ji hêla derdoreke berfireh ve hatiye hatiye destekkirin û sempatiyek jê re çêbûye. Bêguman taybetmeniya herî balkêş a têkoşîna azadiya Kurd û paradîgmaya Konfederalîzma Demokratîk ew ku azadiya jinê kiriye navenda xebatan.''
Li gorî YJK-E'yê biryara domdakirina qedexeya li ser PKK'ê ya Elmanyayê, yasaya polîsan ku tê xwestin were geşkirin û bi geşbûna miliyetgirî-rastgiriyê ku ji van ne bêrî ye, Elmanya ji demokratbûnê dûr dikeve û nêzî standartên Tirkiyê dibe.
YJK-E'yê herî dawî bang li jinan, gelê Kurd, femînîst, hêzên demokrasiyê kir ku li dijî qedexeya li ser PKK'ê, yasaya polîsan û geşbûna milliyetgiriyê tevlî meşê bibin û bang li Elmanyayê kir ku dev ji polîtîkayên krîmînalîzekirina Kurdan berde.

# Em ê serî li Dadgeha Federal a Iraqê bidin

Berdevka Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê Tara Hisên diyar kir ku wê ji ber girtina Navendên Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê serî li Dadgeha Federal a Iraqê bidin, lê dixwazin bi rêya diyalogê pirsgirêkê çareser bikin.
Piştî ku li Herêma Kurdistanê çend navendên Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê bi biryara Hikûmeta Herêma Kurdistanê hate girtin, Berdevka Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê Tara Hisên eşkere kir ku wê serî li Dadgeha Federal a Iraqê bidin.
Berdevka Tevgera Azadî Tara Hisên bal kişand li ser hewldanên berê ji bo fermiyetê hatine kir û got; "Parêzerê me timî ji bo wergirtina fermiyetê ji Wezareta Hundîrin di nava tevgerê de bû. Em amade ne biçin li gel Wekîlê Wezarata Hundirîn rûnîn. Dosyayên ku me ji bo wergirtina fermiyetê dane bînin. Amadene ji bo wergirtina fermiyetê li Herêma Kurdistanê hewldanên xwe zêde bikin. Em niha rewşê dişopînin û em dixwazin biryara dawî ya aliyên peywendîdar bizanîn."
Tara Hisên wiha dewam kir; "Em dikarin serî li Dadgeha Federal a Iraqê û Komîsyona



Bilind a Hilbijartina Iraqê bidin ku daxwaza wergirtina fermiyetê ji wir destpê dike. Me li wir kar ji bo wergirtina fermiyetê kiriye. Li Parlamentoya Iraqê hewldan hene ku vê mijarê bêxin rojeve civîna parlamentoyê. Ji bo ku li ser mijarê guftûgo bê kirin ku gelo hikûmeta Herêma Kurdistanê bawerî bi serweriya Iraqê heye yan na."
Berdevka Tevgera Azadî Tara Hisên diyar kir ku li gorî wan li dijî helwesta neteweyî û xeta têkoşîna azadî plan hene û wiha pêde çû; "Welatên bi hêz beşek ji vê planê ne. Zexteke li ser xeta têkoşîna azadiyê. Tevgera Azadî qet ne girêdayî ti welatên dagirkere. Ji bo mafên neteweyî yên gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê û Iraqê ti caran tawîz nedaye. Sedemê astengkirina karê me, siyaseta ku weke Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê didene meşandine."
Berdevka Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê Tara Hisên herî dawî wiha got; "Hejmarek kesayet, parlamenter û dostên me yên di nava partiyên siyasî de, ji bo ku bi rêya diyalogê bigihîn çareseriyê bi aliyên peywendîdare di nava guftûgoyan de ne. Em hewl didin ku bi rêya dîplomasî çareser bikin."…*ROJNEWS*

# Dixwazin di nav gelan de fîtneyan derxin

**Hevserokê Meclisa Zagonsaz a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û gundewarê wê Farûq El-Maşî diyar kir dewleta AKP'ê bi hedefgirtina rûspiyan hewl dide aramî û ewlehiya li herêmê têk bibe. El Maşî bang li welatiyên Bakurê Sûriyê kir ku li hember derxistina fitneyan hevgirtin û yekîtiya xwe xurt bikin.**



Farûq El-Maşî destnîşan kir ku baskên îstixbarata AKP'ê bi hedef girtina rûspiyan hewl dide aramî û ewlehiya herêmên Bakurê Sûriyê têk bibe û tevna civakî xirab bikin. Şêxê êla Bûbena û hevserokê Meclisa Zagonsaz a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û gundewarê wê Farûq El-Maşî diyar kir ku aliyên ku dixwazin fîtneyan di navbera gelên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de derbixin, hewl didin bi rêya kuştina kesên sembol ê êlên Ereban li herêmê ewlehî û aramiyê têk bibin.

Di berdewama gotinên xwe de El-Maşî diyar kir ku, dewleta tirk bi taybet bi rêya hedefgirtina sembolên êlên herêmê û belavkirina hin îdiayên qirêj hewl didin tevna civakî ya Bakurê Sûriyê têk bibin. El-Maşî wiha got: "Tirkiye ji parçekirina tevna civakî ya herêmê armanc dike herêmê zeîf bixe da ku berjewendî û timayên xwe li herêmê pêk bîne."

Di berdewamiya gotinên xwe de El-Maşî piştrast kir ku gelên herêmê xwe bi xwe birêve dibin û ew têghiştine û dizanin ku xeteriya dewleta tirk li ser wan çiye û got, "Ji ber ku bi çavên xwe dîtin dewleta Tirk li gelek herêm dagirkir û li wan herêm ku dagir kir jî bi çeteyên xwe re kiryarên qirêj dike. Ev rastî bi taybet jî li Efrînê pir eşkere bû."

Têkildarî sedema tevlêbûna ciwanên herêmê nav refên QSD'ê El-Maşî got, "ciwanên Bakurê Sûriyê ji bo ku herêmên xwe ji bin dagirkeriya çeteyên DAI'Şê rizgar bikin û di heman demê de ji bo gelê xwe bi parêzin tevlî refên QSD'ê dibin. Ev hêz ne bi armanca parçekirina yekîtiya xaka Sûriyê hatiye avakirin an jî bibe xeteriyek li ser dewletekî din."

Di dawiyê de Farûq El-Maşî bang li hemû şêniyên herêmên Bakurê Sûriyê kir ku hevgirtin û yekîtiya xwe ava bikin û li hember kompoyên dewletên ku timayên wan li herêmê hene bisekinin û bi fîtne û îdiayên wan aliyan neyin xepandin…*ANHA*

## Bakurê Sûriyê ji bo Tirkiyê gef nîne



Berpirsê Têkiliyên Diplomatik a PYD'ê Salîh Muslim, êrîşên dewleta Tirk li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriye nirxand û wiha got: "Em tu car nebûn dijminê gelên Tirkiyê. Tu carî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo gelên Tirkiye ne talûke û ne gef in. Dewleta Tirk Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo xwe weke gef dibîne û bi cê hêncetê êrîşên xwe berdewam dike. Berpirsê Têkiliyên Diplomatik a PYD'ê Salîh Muslim, ku beşdarî civîna Danûstandinên Sûrî-Sûrî ku li ser banga MSD`ê li bajarê Eyn Îsa bi dirûşmeya "Danûstandinên ji bo avakirin û pêşxistina Sûriyê" pêk hatibû; helwesta dewleta Tirk ya li dijî Bakur û Rojhilatên Sûriye nirxand. Muslim wiha got: "Em tu car nebûn dijminê gelên Tirkiyê. Tu carî Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo gelên Tirkiye ne talûke û ne gef in."

**POLÎTÎKAYÊN SÛRIYÊ TÊK ÇÛN'**

Muslim, destnîşan kir ku polîtikayên Tirkiye yên derbarê Sûriyê de hilweşiya ye û wiha got: "Heta niha Tirkiye tu fêde ji vî aqilê xwe negirtiye. Polîtîkayên Tirkiyê yên derbarê Sûriyê de bêtir zerar dide gelên Tirkiyê. Ev hemû îro li Idlibê derketin holê. Li vir ketiye nava çiravekê û celbê. Ji bo ser vê rewşa xwe bigire êrîşî der û dorên din dike. Dixwazin Bakur û Rojhilatên Sûriye bikin hedef. Tişta ku li Efrînê kirin dê nikaribin li Rojhilatê Firatê bikin. Di civîna MGK'ê de dîsa heman gef hebûn. Me li mala me tehdît dike. Me berê jî got. Em dê li dijî hemû êrîşan parastina xwe ya rewa pêk bînin. Parastina me parastina rewa ye. Li herêmê hevsengiya navneteweyî heye. Me berê jî got. Bi destê Tirkiyê DAIŞ pêş ket. Tirkiyê DAIŞ ava kir. Hê jî wan xwedî dike. Niha DAIŞ li Dêra Zorê ketiye zorê. Ji bo êrîşên li ser DAIŞ'ê kêm bike, serî li rê û rêbazên cuda didin."

Muslim helwesta DYA jî rexne kir û wiha got: "DYA li hemberî kesên li dijî "terorizmê" bi wan re tev digerin xwedî berpirsiyar e. Tirkiye dikare gavên ne li bendê bavêje. Ev yek wê zerarê bide gelê Tirkiyê. Em tu car nabûn dijminê gelê Tirkiyê. Em nabin dijminê wan jî. Îktîdara AKP-MHP'ê polîtîkayên faşist pêş dixe. Bi êrîşên li dijî me dixwazin xwe ji krîzên xwe rizgar bikin. Ev polîtika zerarê dide gelên Tirkiyê. Heta niha me tu carî êrîş nekir û em êrîşî gelan nakin. Ger ku Tirkiye di vê mijarê de bi aqil tev bigere wê baş bibe."…*MA*

## Emê dosya Tevgera Azadî bibin Wezareta Hundirîn a Iraqê



Parlamenterê Tevgera Goran ya Parlamentoya Iraqê Xalib Mihemed diyar kir ku wê dosya girtina navendên Tevgera Azadî bibin Wezareta Hundirîn a Iraqê û got; "Çawa dibe partiyek li Iraqê fermiyeta wê hebe, lê li Herêma Kurdistanê navendên wê were girtin.

Di 25'ê mijdarê de Hikûmeta Herêma Kurdistanê bi daxuyaniyê diyar kir ku ew ê partî û rêxistinên ku fermiyeta wan nîn e, bigirin. Piştî vê daxuyaniyê di 26'ê mijdarê de hêzên Asayîşa Silêmaniyê çûn navenda Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê (Tevgera Azadî) û pirsa "fermiyeta we heye yan na?" kirin.


Li ser vê yekê rêveberiya Tevgera Azadî di êvara heman rojê de daxuyaniyek da çapemeniyê û da zanîn ku li ser asta Iraqê fermiyeta wan heye, her wiha ji bo Herêma Kurdistanê jî gavên pêwîst avêtine, lê hikûmeta herêmê bersiva wan nedaye..

Ji 27'ê Mijdarê ve çend navendên Tevgera Azadî hatine girtin. Herwiha li Kelar jî hêzên asayîşê dest danîne li ser navndê û 4 endamên Tevgera Azadî yên li navendê de derî li ser wan girtîne û rehîn hatine girtin.

Parlamentorê Tevgera Goran ya Parlamentoya Iraqê Xalib Mihemed şevê din çû serdana van her çar endamên Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê yên rehîn hatine girtin.

Parlamenterê Tevgera Goran ya Parlamentoya Iraqê Xalib Mihemed li ser hesabê xwe yê tora civakî daxuyaniyek da û diyar kir ku wê dosya girtina baregehên Tevgera Azadî bibin Wezareta Hundirîn a Iraqê û got; "Çawa dibe partiyek li Iraqê fermiyeta wê hebe, lê li Herêma Kurdistanê navendên wê were girtin. Cûdahî di navbera biryara Qubat Talebanî û bombebarankirina herêma Qendîlê ji aliyê balafirên Tirk ve nîne."

Herwiha şevê din Parlamentera Tevgera Goran ya Parlamentoya Herêma Kurdistanê Şirîn Emîn



serdana van endamên Tevgera Azadî ya Civaka Kurdistanê yên li baregeha Kelarê rehîn hatine girtin kir.

Şirîn Emîn jî li ser hesabê xwe yê tora civakî ev daxuyanî da; "Qet belge û fermanekî fermî nîne ku ka ji ber çi endamên Tevgera Azadî ên tên ceza kirin. Nayê zanîn ji aliyê kê ve fermana cezakirina wan hatiye dayîn. Endamên Tevgera Azadî li navenda xwe hatine desteserkirin. Asayîşê derî li ser wan girtiye û kilîtê nadin. Ev kiryarên asayîşê nayên pejirandin. Binpêkirina mafê mirovan, partî û şikandina rûmeta endamên Tevgera Azadî ne. Divê li hemberî vê derkevîn."…*ROJNEWS*

## Duyemîn kongreya PYD`ê ya Helebê pêk hat



Rêxistina PYD'ê ya şaxê Helebê bi dirûşmeya "Bi rêveberî û bi rêxsitin em ê Efrînê rizgar bikin û Sûriyeke nemerkezî û demokratîk ava bikin" duyemîn kongreya xwe li bajarê Helebê li dar xist.

Partiya Yekîtîya Demokratîk (PYD) ya şaxê Helebê, duyemîn kongreya xwe li Hola Efrîn a herêma Şêqeyîf bi beşdariya 260 delegeyan li dar xist.

Endamê Desteya Rêveber a TEV-DEM`ê ya herêma Efrînê Hesen Koçer di kongreyê de axivî û tekez kir ku lidarxistina kongreya duyemîn a PYD`ê ya Helebê, ji bo birêxistinkirina endaman e ku li hember komployên li dijî gelê Sûriyê hişyar bin.

Hesen Koçer bal kişand ser roja kongreyê ku di salvegera şehadeta Şîlan Kobanê û hevalên wê de pêk tê, her wiha siyasetên qirêjî yên li ser gelê Kurd ku doza mafên xwe dike, şermezar kirin. Koçer destnîşan kir ku komplogeran li ser gelê Kurd, piştî ku planên nasname û çanda Kurdan tune bikin vala derketin, di şoreşa Rojava de siyaseta xwe guherandin û dest bi şopandina şerê taybet kirin û hewl dan fitneyan di nava gelan de derxin.

Hesen Koçer îşaret bi berxwedana gelê Efrînê kir û wiha got : "Tu carî gavek paşde neavêtin, li pêş çavên wan zarokên wan şehîd bûn, lê belê ew bi axa xwe ve girêdayî ne."

Koçer da zanîn ku yekitiya axê û gelan yek ji lingên sereke yê vê kongreyê ye û wiha dewam kir: "Lidarixistina kongreyê ne tenê ji bo dirûşmeyan e, ew ji bo birêxistinkirinê ye ku bikarin li hember komployên li dijî gelê Sûriyê hişyar bin."

Endamê Desteya Rêveber a TEV-DEM`ê Hesen Koçer di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku divê gel baweriya xwe bi tu hêzên derve neyne, hêza hevgirtî ew felsefe û raman e ku şoreşa Rojava li ser dimeşe û gelek destkeftiyên mezin bi dest xistin...*ANHA*



# Li 6 bajaran grêva birçîbûnê tê kirin

**Çalakiyên li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dikin. Piştgiriya ji bo çalakiya grêva birçîbûnê ya Parlamentera HDP'ê Leyla Guven a li dijî tecrîdê berbelav dibe. Li 6 bajarên Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê ji bo 3 rojan; 2,3 û 4'ê Kanûnê li Stenbol, Enqere û Mêrsînê, 7-8-9'ê Kanûnê jî li Mûş, Şirnex û Mêrdînê , wê grêva birçîbûnê were destpêkirin.**




Piştgiriya ji bo çalakiya grêva birçîbûnê ya Parlamentera HDP'ê Leyla Guven a li dijî tecrîdê berbelav dibe. Li 6 bajran ji bo 3 rojan wê grêva birçîbûnê were kirin.

Ev 22 roj in Hevseroka KCD'ê û parlamentera Colemêrgê ya HDP'ê Leyla Guven li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di grêva birçîbûnê de ye. Piştî çalakiya Guven a li Girtîgeha Tîpa E'yê ya Amedê, girtiyên PKK'ê û PAJK'ê ji 27'ê Mijdarê ve dest bi grêva birçîbûnê ya 10 rojan a dorveger kirin.

**WEKÎL JÎ WÊ TEVLÊ BIBIN**

Navên ku di nav wan de parlamenterên HDP'ê jî hene, 2,3 û 4'ê Kanûnê li Stenbol, Enqere û Mêrsînê, 7-8-9'ê Kanûnê jî li Mûş, Şirnex û Mêrdînê wê grêva birçîbûnê ya ji bo 3 rojan bikin.

Çalakiyên destekdayinê yên ji bo çalakiya Guven beriya niha li Edene, Riha, Wan, Amed û Colemêrge jî hatibûn kirin û hatibû gotin heta ku tecrîd ranebe wê çalakî bidomin.

## Elmanya dixwaze welatiyên xwe yên DAIŞ'î bibe



Hikumeta Elman a Federal ragihand, ji bo 35 DAÎŞ'iyên welatiyên Elman ên di destê YPG'ê de ne bînin Elmanyayê, ew hemû alternatîfan dinirxînin. Dibe ku Xaça Sor jî ji bo DAÎŞ'iyan bikeve dewrê.

Ji bo 35 welatiyên Elman (10 mêr, 10 jin, 15 zarok) ku di operasyon û pêngavên YPG'ê yên dijî DAÎŞ'e de bi saxî hatin girtin, ev demek bû ku bang li hikumeta Elman a federal a bi serokatiya Merkel dihate kirin. Ji ber ku rêveberiya Berlînê ji bo van DAÎŞ'iyan xwe kerr kir, Partiya Çep mijar xist rojeva meclîsê û pêşnûme pirsek pêşkêşî hikumeta federal kir. Pêşnûme pirs bi pêşengiya Parlamentera Partiya Çep Ûlla Jelpke ve hate amadekirin. Bi navê hikumeta Merkel, Wezareta Karên Derve bersiv da pêşnûme pirsê. Di bersiva kin a hikumeta federal de hate gotin, hikumet ji bo anîna welatiyên Elman ji bo Elmanyayê hemû alternatîfan dinirxîne. Hate ragihandin ku serdozgeriya federal jî der barê 14 welatiyên Elman ên di destê YPG'ê de ne, lêpirsîn daye destpêkirin.

**TÊ GOTIN, WÊ DI SER IRAQÊ RE BÎNIN ELMANYAYÊ'**

Yek ji alternatîfan ew e ku piştî hevdîtina bi YPG'ê re, wê Elmanên endamên DAÎŞ'ê derbasî Iraqê werin kirin û li wir radestî yekîneyên ewlekariyê yên Elman bên kirin. Ji ber ku nûnertiya fermî ya Elmanyayê li Sûriyê nîne, tê gotin ku wezîfedarên Xaça Sor an jî rayedarên Rêveberiya Federe ya Başûrê Kurdistanê karibin bikevin dewrê.Tê texmînkirin, hejmara kesên ji Elmanyayê derbasî Sûriye û Iraqê bûne û cihê xwe di nava çeteyên DAÎŞ'ê de girtine, hezar derbas kiriye. Di nava çeteyên ji Elmanyayê tevlî DAÎŞ'ê bûn, welatiyên Tirk di rêza destpêkê de ne. Li gorî hikumeta Elman, aqûbeta beşeke biçûk a kesên çûne Iraq û Sûriyeyê û tevlî DAÎŞ'ê bûne, tê zanîn. Hatibû eşkerekirin ku 170 ji van hatine kuştin.

**DI DESTÊ YPG'Ê DE DAÎŞ'IYÊN JI 46 WELATAN HENE**

Di encama operasyonên yekîneyên taybet ên YPG'ê de 2700 DAÎŞ'î niha li girtîgehên li Rojavayê Kurdistanê ne. 800 ji van ji 46 welatan e ku piraniya wan welatiyên rojavayî ne. Rêveberiya Rojava bi taybetî bang li DYA, Fransa û Elmanyayê kiribû ku bikevin dewrê û bi erk û berpirsyariya darizandina DAÎŞ'iyên biyanî rabin.

## Gotinên Rêber Ocalan îro pêk tên



Hejmarek ji welatiyên Efrînê ku bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re rûniştine destnîşan kirin ku bi saya fikr û felsefeya Ocalan gelê herêmê gelek destkeftî bi dest xistiye.

Kesên ku rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan dîtine, bîranînên xwe yên van hevdîtinan vedibêjin.

Welatiyê bi navê Umer Mihemed ji gundê Xelîl ê girêdayî navçeya Şiyê ye û li Şehbayê bi cih bûye. Umer du caran di salên 1991-1992'yan li Lubnanê li Akademiya Mehsûm Korkmaz bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re rûniştiye.

Umer destnîşan kir ku civînên Ocalan girêdayî doza Kurd, welatparêziyê şêwazên parastinê û mafên gelê Kurd bûn û wiha got: "Ocalan di civînên xwe de doza Kurd şîrove dikir û hertim bang li me dikir ku em ji nasnameya Kurdî, welatparêziyê û axa xwe hez bikin."

Girêdayî mijara wekheviyê di navbera jin û mêr de ku Ocalan behsa wê dikir Umer wiha got: "Îro em dibînin ku hemû gelên herêmê li ser fikr û felsefeya Ocalan dimeşin. Bi taybet Rojhilata Navîn û Bakurê Sûriyê. Îro li herêmê di navbera jin û mêr de wekhevî pêk tê. Ev gavên dîrokî ne. Gotinên Ocalan di rastiyê pêk tên."

Cemal Îbiş ê ji gundê Ziyaretê yê girêdayî navçeya Şêrawayê di salên 1991-1992'yan de li Lubnanê bi Ocalan re rûniştiye. Têkildarî hevdîtinên wî bi Ocalan re Cemal Îbiş wiha got: "Ez du saetan bi Ocalan re rûniştim. Ocalan ji me re civînek çêkir. Di civînê de behsa mirovahiyê û parastina mafên civakên Rojhilata Navîn û xilasiya wan ji zulmê û zordestiyê kir."

Cemal wiha got: "Bi rêya civînan em têghiştin şêwazên birêxistinkirinê. Ocalan hertim destnîşan dikir ku ji bo li hember têgehên dijmin bê sekinandin divê civak xwe birêxistin bike. Îro jî encamên fikrên wî di destkeftiyên gelê herêmê de em dibînin."

Di dawiyê de Cemal got: "Di civînan de Ocalan behsa dijminên gelê Kurd ji berê ve dikir. Îro em dijminê gelê Kurd ê yekemîn dibînin. Dagirkirina Efrînê mînaka vê yekê ye."…

*ANHA*

## Li başûr lîstokên nû û yekîtiya netewî



Mihemed SEYDÎ

Êriş li ser gelê kurd ji aliyê dagirkerên li ser gelê kurd û axa Kurdistanê dewamin û bi her cûre rêbazan pêk tên. Di sêrî de tecrîdkirina rêber Ocalan û êşkenceya li Îmralî. Bi van êrişên bê serûber ên qirkirin, talankirin û kuştinê li bakurê Kurdistanê. Dîsa dagirkirina herêmên Rojavayê kurdistnaê û gefên ku her roj dewleta Tirk Eşkere dixwe jî kes nikare çavên xwe jê bigre. Dîsa hevkariya ku çi Rêjîmên Îran, Sûriyê û Îraqê bi rêbazên cûda li gel dewleta Tirk dikin û van êrişan pêk tînin..Yanî di her alî de êrişî destkeftiyên gelê kurdistanê dikin û hêzên mêtînger bi hemû hewldanên xwe çi bi rengekî eşkere çi jî ne eşkere dixwazin Desteftiyên gelê kurd ji destê wan derbixin û têk bibin..

Di Cotmeha 2018'an de 18. Civata giştî ya KNK hat lidarxistin. Dîsa ji bo yekîtiya Netewî û lidarxistina kongreya Netewî biryar hatin girtin. Di vê civatê de xetên SOR ên Netewî jî hatin diyarkirin û tixubên wê yên ku divê neyên derbaskirin û binpêkirina van xetan jî Sûcên netewî ne û binpêkirina berjiwendiyên gelê kurdistanê ye..Aliyên ku heta niha li pêşiya lidarxistina Kongra Netewî dibin asteng li ber çavanin û pêwist nake em careke din navê wan jî bibêjin. Ew alî tam li gel dagirkerên ser axa kurdistanê cihê xwe digrin û hebûna dagirkeran rewa dikin. Vê cihgirtina xwe ya li gel dagirkeran jî bi hencetan rewa dikin.

Raste her aliyên siyasî serbestin têkiliyan bi kê re dixwazin deynin. Ew têkilî aborî dibin, siyasî dibin çi jî bazirganî bin ferq tune lê dema li ser hesabê gelê kurd be ev yek nabê mafê kesî ku rewatiyekê bidin van têkilî û itîfaqan. Ew raste rast sûce.

Ya sosret jî ew e ku Hin caran ji dagirkeran re jî hincetan dibînin. Beriya cend rojan keseke ku rêvebera komika bi navê "ENKS" li ser Ekranên Medyayê behse rewşa li Efrînê dike û dibêje ku dewleta Tirk ji ber PYD'ê li wir bû êriş kir, û di heman demê dibêje ku dewleta Tirk naxwaze li ser sînorê wê statuyeke kurdan hebe. Yanî bi xwe jî li xwe mukur tê ku dewleta Tirk ji ber naxwaze kurd bibin xwedî statu êriş kirin. Lê hincetan jî ji dewleta Tirk re dibîne ku PYD sedeme.

Dîsa biryara ku herî dawî ji aliyê YNK'ê ve li ser Tevgera Azadî li Silêmaniyê hate girtin û muhrkirina deriyê navendên wê gelo xizmetê ji kêre dike? YNK'ê jî di bin navê hevkarî û berjiwendiyan de van gavên xwe tîne ziman û dîsa hincetên xwe diyar dike. ji kê jî bipirsî wê bersiva ku ev biryar û gava YNK'ê li ser daxwaza dewleta Tirk pêk hatiye bibersivîne.

De hîcar em behse Yekîtiya netewî dikin. Li vir êdî divê her kes bersiva viya bi Erê an Na bide. Yekîtiya netewî dixwazin an na. Êdî xwe li pişt hincetan de veneşêrin.. Ev jî Erkên demê yên KNK'ê ne. divê gavekî bi vî rengî bavêje û referandomeke wiha bide destpêkirin. Ji bo gelê kurd helwestên hemû aliyan eşkere bibîne. Û hincetên ku ji bo van biryar, têkilî û gavan werin dayîn jî neyên qebûlkirin.

Ger hincetan dixwazin û bi van hincetan van hewldanên xwe yên li gorî dijmê gelê kurd rewa dikin wê demê dewleta Tirk jî dema êrişî gelê kurdistanê dike, bi dehan bajarên kurdan xirab dike, rojane li kurdistanê êrişên tunekirinê pêk tîne, bi balafiran gundên başûrê kurdistanê dide ber bombebaranan,Ji bo van hemû êrîşan jî ew hincetên xwe tîne ziman..

Ya ez dixwazin bibêjim ku ne ya qebûlkirinê ye aliyek li dijî yekîtiya netewî tevbigerî û hincetan nîşan bidî . li vir tu hincet nayên qebûl kirin. Helwest tenê ew e ku xizmete yekîtiya netewî û berjiwendiyên gelê kurd dike an na.